

Pêvajoya 'Aştî û Civaka Dêmkokratîk' - Armanc, Bendewarî û Astengîyên li ser R'êya Wê

Nivîskar: Ezîzê Cewo (Ezîzê Cewo) | Dîrok: 14.06.2026 (Payatîgorsk) |

Weşan: Amîda Kurd

Kurte (Abstract): Di vê lêkolînê û nirxandina berfireh de, lêkolîner û nivîskar Ezîzê Cewo (Ezîzê Cewo) Pêvajoya 'Aştî û Civaka Demokratîk', banga dîrokî ya 27ê Adara 2025an a Abdullah Ocalan, hevdiştinên şandên Meclîsê û Partiya DEMê yên li Îmraliyê, daxuyaniyên rayedarên desthilata AKP-MHPê (Recep Tayyip Erdogan, Devlet Bahçeli, Numan Kurtulmuş) û krîza Destûra Bingehîn a Komara Tirkiyeyê (Xalên 1, 2, 42 û 66) di çarçoveya Rêzîknameya Neteweyên Yekbûyî (NY) de analîz dike. Nivîskar destnîşan dike ku çareserîya mayînde ya pîrsgirêka Kurd li Kurdistan û Tirkiyeyê tenê bi peymanê civakî û destûrê bingehîn a demokratîk pêkan e.

Peyvên Sereke: Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, Ezîzê Cewo, Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê, Abdullah Ocalan, Îmralî, Kurdistan, Pîrsgirêka Kurd, Peymana Civakî.

1. Pêvajoya 'Aştî û Civaka Dêmkokratîk' û Banga Dîrokî ya 27-ê Adara 2025-an

Bûyerên K'urdistanê û Herêma R'ojhilata Navîn hert'im di navenda bala me da bûne, me ew bi baldarî şopandine û, gor derfet'ên heyî, nirxandine û dîtin û şîroveyên xwe di derbarê wan da weşandine.

Hema ji destpêkê va me Pêvajoya 'Aştî û Civaka dêmkokratîk' şopandye û di derbarê wat'eya vê Bûyera dîrokî da, di derbarê t'erefên cuda yên têgihîştina wê û dur'ûtîya r'ayedarên r'êjîma T'irkîyayê û wan astengî û nak'okîyan da nirxandin pêkanîne û şîroveyên xwe weşandine.

Lîsteya gotarên bi vê mijarê jî xwendevanê di dawîya vê nirxandinê da bibînin.

Wisa jî, divê bê gotin, her çiqas, ji hêla r'ayederên r'êjîma AKP/MHP va ewqas astengî û nak'okî li ser r'êya vê pêvajoyê hatine derxistin, lê, yek e, îro encamên Pêvajoyê li ber ç'avan in. Û r'êjîm jî, ji bo ku pêvajoyê têkbibe, an berê meşa wê biguhêr'e, an jî wê wek xwe nîşanî civakê û r'aya giştî bike, bê navber serî li dek û dolab û lîstikên cihêr'eng dide...

Wekî dinê, her pîrs di wê da ye, k'a k'î bi çî ç'avî li wan encaman dinîhêr'e, wan têdîgihîje û bi çî wat'eyê wan dinirxîne...

Û ya sereke, ya ku îro li ber ç’avan e, ew e, ku: piştî goşangîrîya demdirêj a li hember R’êberê gelê k’urd bir’êz Ocalan, Dewlet Baxçelîyê hevp’ar û hevpeymanîyê Hukumeta K’omarê (tiştêkî mîna hevserokwezîrtîyê?!) dibêje – bila Abdulla Ocalan bê di Meclîsê da biaxeve û bang li PKK-ê bike! Û hema li wira ew behsa Mafê Hêvîyê jî dike.

Ev tê çi wat’eyê?

Ango, r’êvebirîya T’irkîyayê êdî têgihîştîye, ku pîrsgirêkên K’omarê ewqasî gihîştîne, wisa li hev piç’ikîne, ku êdî metirsîya têkçûna wê derk’etîye holê, û ç’areserîya pîrsgirêkan jî, dikare her bi r’êya Ocalan pêk bê. Lewra jî, xwestin, xwe bi vê derfetê va bigirin, înt’sîyatîvê hildin destê xwe û bidin xuyan, xwedêgiravî, dixwazin pîrsgirêkan ç’areser bikin. Lê, di r’astîyê da ewana her tiştî dikin, ku demê li xwe bidin bihurandin û bi dubarekirina gotinên vala û şewazî pêvajoyên guhar’tin û veguhar’tinê vala derxin û bêwat’e bikin, û bi wî awahî ji bo demekê t’emenê K’omarê dirêj bikin. – Lêbelê, heya k’engê?

Lê, wek ku tê xuyan, mîmarê vê pêvajoyê, bir’êz Ocalan, hema di destpêkê da armancên wan têgihîştibûye, lewra jî, di banga xwe ya 27-ê adara sala 2025-an da lêymotîva vê pêvajoyê, wek mercê sereke, danye pêş: “...R’êzgirtina nasnameyan, azadîya r’amanê, r’êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhatîyan t’enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe. Sedsala k’omarê ya duyemîn t’enê wê demê dikare bibe xwedî yekîti û berdewamîyeke mayînde, eger ew bi dêmokrasî bê t’acîdarkirin. (Bi t’aybet bala xwe bidine vê hevokê! – E. C.). Ji dêmokrasîyê pêva, – R’êber Apo didomîne, – t’u r’eyeke dinê ya lêgerîna p’ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk’ên e...” – Bi vê r’a her weha di vê banga dîrokî da p’eyameke dinê jî heye: “Wek ku her civak û partîyek a hemdemî, ku hebûna wê bi darê zorê nehatye dawîkirin, ...” [1] – Ango, bi darê zorê, hîç hêzek nikare PKK-ê dawî bike!

Û ev p’eyamên R’êber Apo jî, hem ji hêla r’êvebirîya T’irkîya îroyîn va, hem ji hêla r’êvebirîya T’evgera R’izgarîxwaz a Net’ewî va, hem jî ji hêla r’aya giştî ya K’urdistanê, T’irkîyayê û Cîhanê va bi baldarî hatine xwendin.

Û, her çiqas evan p’eyamana di cîhanê da bi berfirehî dengvedane, lê, yek e, r’êvebir û r’ayedarên K’T’-ê wek xwe mane: ew navê vê pêvajoyê, yê ku ji hêla mîmarê wê va “Pêvajoya ‘Aştî û civaka dêmokratîk’” hatye navkirin, wek “Pêvajoya T’irkîya bê têt’or” nav dikin û gotinên xwe yên kevn û xilmetmayî dubare dikin: “r’êxistina têt’orîst”, “divê bên û ç’ekên xwe

r'adestî T'irkîyayê bikin", "ev tişt, ên ku îro pêk tên, nîşana têkçûna têr'orê ne", "...T'irkîyake bê têr'or"- û yên dinê yên wek van bêwat'e.

Mirov van gotinan dixwîne, an dibih, matma dibe û nizane çi jî bibêje ê - ev mirovana bi r'astî pirsê wisa têdigihîjin, an t'enê derdê statûsa xwe ne, ya ku hêzên mêtîngerîya navdewletî dane wan, û habûna wan a fîzîkî û wat'eyî, bi hemû sîstêm û sazîyên wan va, li ser van derwan xwe li ser p'êyan r'adigirin!? An jî ew naxwazin, ku ev şer'a r'aweste û her tiştî dikin, ku PKK dest ji têk'oşîna çekdarî bernede, lewra ku bazirganîya here mezin şer' e. Û, eger ev ç'avkanîya dewlemendbûna wan bimiç'iqe, ewê bê p'ergal li navberê bimînin, û kesekê silavê jî nede wan ...

Ma îro di cîhanê da k'î nizane, ku, eger di T'urkîyayê da têr'orek heye, ew jî têr'ora dewletê bi xwe ye, ya ku li hember gelê k'urd û t'evahîya gelên herêmê hatye û îro jî tê meşandin, û têk'oşîna gelê k'urd a bi serk'êşîya PKK-ê jî, têk'oşîna li dijî têr'ora dewletê bûye!

Ji bo ku li vira hinek tişt neyên dubarekirin, xwendevanên hêja dikarin di vê derbarê da bi hûrbînî di van gotarên me da bixwînin: "Pêvajoya aşîyê û civaka dêmokratîk, helwesta r'êjîma AKP/MHP û r'astîyên dîrokî!" [2] û "Her çi qas r'êjîma AKP/MHP hewl dide, ku Pêvajoya Aşîyê û Civaka Dêmokratîk têkbibe, lê, yek e, ew dimeşe û r'astîyên dîrokî derdixe holê". [3]

2. Hevdîtinên Îmralîyê, Şandên Meclîsê û Helwesta R'êjîma AKP/MHP-ê

Îro êdî r'astîyek li holê ye: helwest, daxwîyanî û şiroveyên r'ayedarên r'êjîma AKP/ MHP zêde girîngya xwe nînin, lewra ku êdî nikarin ne r'aya giştî ya cîhnê, ne jî ya K'urdistanê û T'irkîyayê bidin bawerkirin (ango, bixapînin!)

Û r'aya giştî ya cîhanê di r'astîyekê da bawer e: Ankarayê serlêdana Îmralîyê kirye!

A, mirov dikare r'ewşa îroyîn bi vî awahî formûle-şêwazdar bike.

Ji bo ku ev r'ewşa bê têgihîştin, divê tişteke bê zanîn: heya, eger mirov wan hevdîtinên veşartî yên r'ayedarên dewletê yên li Îmranlîyê, bi R'êber Apo r'a li hêlekê jî bihêle, ev şandên ku diçin giravê û hevdîtinan pêk tînin, ji endamên partîya DEM-ê, partîyên dinê, an ên Komîsîona Meclîsê pêk tên, ne wisa!?. Û ew hemû jî endamên bilindtirîn dezgeha (organ) nûnertîyê û zagondariyê ya r'êvebirîya dewletê ne (Meclîs), ango, ew nûnerên dewletê ne (parlamenter in!), û statûsa her yekê/yekî ji wan jî, di nava sazîya dewletê da wek a wezîrê dewletê ye. Û her carê, dema ew diçin Îmralîyê, ew wek

şandên dewletê diçin, her çiqas bi şêwazî (formal) wisa nayên navkirin jî ... (Helbet, li vira divê bê zanîn, ku ev statûsa ji hêlekê va erk' û berpirsyariya parlamenterên partiya DEM-ê di qada siyaseta lêgal da girîngtir dike, lê ji hêla dinê va barê ku di vî warî da dik'eve ser nilên wan û bersîvdariya ku ew pê r'adibin, girantir dike).

Û evê yekê hem derdorên siyasî yên hindur'ê T'irkîyayê tê têdigihîjin (dij, an t'eref, zêde ne girîng e!), hem jî yên asta navnet'ewî.

Ev tê çi wat'eyê?

Ma kesek, eger ew xwedî heşmendîyeke normal be, dê bikaribe bibêje, ku ev nayê wat'eya p'ejirandin û naskirina pirsgerêka net'ewa k'urd û nûnerîya wê di kesê bir'êz Ocalan da? Ma ne, yên ku r'êvebirîya vê dewletê pêk tînin, baş dizanin, k'a doza gelê k'urd xwedî çi armancê ye, k'a di bîrdozîya R'êber Apo da ji bo ç'areserîya pirsgerêka k'urdî çi tê gotin, k'a daxwezên wî û T'evgerê ji bo vê pirsê çi ne?! Ma ne, ev 41 sal in, ku PKK-ê, ji bo r'awestandina têr'ora dewletê ya r'êjîma T'irkîyayê û ç'areserkirina pirsgerêkên net'ewî yên gelê k'urd têk'oşîna siyasî û ç'ekdarî meşandye, û di navbera van 41 salan da dewletê bi sîstêmî lêger'inên zanistî pêkanîne, sazî û navendên wan ên lêk'olînan bê navber bi lêger'inên di derbarê PKK va mijûl bûne, T'irkîyayê, wek dewletek a endama NATO-yê, agahî, dane û delîl û encamên lêger'inên navendên vê r'êxistina navnet'ewî yên di derbarê PKK-ê da ji wê wergirtine...

R'ayedarên K'T' - ji jor heya jêr, T'evgera R'izgarîxwaz a bi r'êberîya bir'êz Ocalan û armancên wê baş dizanin. Û di nava r'aya giştî da jî ev yek baş tê zanîn. Lewra jî, ew daxwîyanîyên vik-û-vala û arzan, ên ku ew r'ojane dubare dikin, nîgara wan a mirovî û r'ayedarî naxemilînin, berovajî wê, hemû nivîşkanî û bêç'aretîya wan li ber ç'avên cîhanê vedikin.

Û her çendî ew dê bi şêwazî gavan jî paşva biavêjin, lê pêvajo destpê bûye, dimeşe û bi xwe r'a gelek r'astîyan derdixe holê. Û gotinên r'ayedarên K'T', yên ku ji hêla asta here bilind va hatine gotin, ên wek: "Bila Ocalan bê di meclîsê da bang li PKK bike!", "Muxatebê herî ciddî Ocalan e!", "Divê statûya Ocalan 'Koordinatoriya Siyasîbûn û Aştiyê' be!", îro êdî di nava gel da wek tişteki ji mêjva divyayî tînin! -Û ev jî ne hemû ye!

Li ser vê p'êlê, serokk'omar ê K'T' Erdoxan li xwe mukur' hatye, ku di welatê wan da dewletê li hember gelê k'urd "şaşîyên sîyasî" (bixwîne: sûc!) pêkanîne. Û wan "şaşîyan" ew weha r'êz dike: kuştin û bê şop windakirina k'urdan ji hêla dewletê va, yên ku kiryarên wan hê jî nehatine diyarkirin, bûyerên ku di zîndana Dîyarbek'irê da pêkhatine, gundên ku ji hêla dewletê

va hatine şewitandin, mirovên ku di nava şevêkê da hatine k'oçberkirin, dayîkên ku nikaribûne di girtîgehan da li gel zar'okên xwe bi k'urdî bi axivîn!

Ew wisa jî li xwe mukur' hatye, ku ji sala 1984-an û virva her hukumetek a T'irkîyayê hatye û gotye - emê PKK têk bibin, - lê ji wan r'a li hev nehatye, û ew çûne...

Ku wan di nava 40 salên derbasbûyî da dîtye, k'a çiqasî zehmet e, ku bi destûra bingehîn a darbek'aran civak bibe yek ... Ku T'irkiye êdî bi destûra bingehîn a darbek'aran nikare berbi siber'ojê ve bimeşe. Êdî pêwîstî bi destûreke sivilan heye, ne ya derbêk'aran". [4]

Û ev hemû encamên vê têk'oşînê ne! Ma, çend sal berê, tiştên weha dikaribûn bi hatana ber heşê kesekî? - Ev pêvajoyê û hemû r'astîyên dîrokî, yên ku wê derxistine holê encamên têk'oşîna mafdar a gelê k'urd in - ên bi r'êberîya bir'êz Ocalan.

3. Gavên Qanûnî, Nîqaşên Ç'ekberdanê û Rastîya Têk'oşîna Gelê K'urd

Her çiqas, bi vê pêvajoyê r'a li T'irkiyayê û Bakurê K'urdistanê pirs a ç'areserîya pirsgerêka k'urdî û gavavêtinên qanûnî yên desthilata T'irkîyayê bûne r'ojeya sereke jî, lê, yek e, ev pêvajoyê dê wek r'ûnekî helandî wisa hêsan û yekawa neher'ike. Divê bê zanîn, heya îro bi dehan nivşên vê herêmê, ya ku wek K'omara T'irkîya hatye navkirin, li ser bingeh û r'êgezên Destûra wê ya bingehîn û r'êjîmên wê yên dijmirovî gihîştine û mezinbûne, lewra jî, her tişt dê wisa bi carekê r'a ç'areser nebe, divê di têgihîştin û bîra civakê da guhar'tin pêk bên, û ev jî dê di r'ojekê da çênebe, lewra ku ew di r'ojekê da pêk nehatye...

Û evan guhar'tinan jî ev pêvajoya dikare bi xwe r'a bîne. Ya sereke ew e, ku civakên K'urdistanê û T'irkîyayê bi bir'yar û sebir beşdarî vê pêvajoyê bibin, bêdeng nemînin, bi wêrekî dîtinên xwe bînin zimên. Û mînakên wisa jî êdî hene!

Wek ku tê zanîn, van demên dawîyê derdorê du mehan hevdîtin bi R'êber Apo r'a pêknedihatin. Em hemû benda helwesta r'êvebirîya T'evgera N'etewî bûn, lewra ku, yên ku evê R'êjîmê bi ser û binê wê va baş nas dikin, ew bi xwe ne, û yên ku hem lêytmotîva sereke ya vê pêvajoyê û hemû hûrbînîyên wat'e, r'ewş û meşa wê ya îroyîn dizanin, dîsa ew bi xwe ne. Ji bilî wê, ewana pirsgerêkan wek navendeke zanistî-lêkolînî dinirxînin!

Lewra jî, helwest û dîtinên T'evgera Net'wî yê di derbarê Pêvajoyê da di nava r'aya giştî ya navnet'ewî, ya K'urdistanê û T'irkîyayê da bi baldarîyeke mezin hatin pêşbazîkirin.

Û ew jî bi Daxwîyanîya R'êveberîya T'evgerê ya bi sernivîsa "Divê desthilatdariya AKP-MHP'ê gavên pêwîst bêyî derengxistinê biavêje!" [5] û hevpeyvîna endamê Akadêîya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan Dûran Kalkan a bi sernivîsa "Têkiliya bi Îmraliyê re bi rêk û pêk nebe, pêvajo bi çêkerî nikare bimeşe!" [6] gihîştin r'aya giştî.

Di vê navberê da şandeke Partîya DEM-ê jî çû Îmraliyê û bi R'êber Apo r'a hevfitin pêk anîn.

Û çend roj jî derbaz nabin, serokê Meclîsa T'irkîyayê Nûman Kurtûlmûş li Fînlandayê di derbarê pêvajoyê da daxwîyanîyek pêşk'êş kir û hewl da, bide bawerîkirin, ku: "Di encama xebatên komîsyonê de r'aporek derk'et holê. Ji bo pêwîstixwestyên wê r'aporê werin cih, siyaset dê berpirsariya dik'eve ser milê xwe bi cih bîne. Hêvîdar im, emê di demeke here nêz de vê pirsê çareser bikin û astenga here mezin a li pêşîya Tirkiyeyê derbas bikin". [7]- Û ev her agahiyên giştî ne, ji bo ku hewayekê bawerdariyê avabike, lê li pişt van gotinan va r'ûyê r'astîn ê vê r'êjîmê yê veşartî heye. Kûrtûlmûş jî, wek hevpartî û hevkarên xwe yê vê r'êjîmê dîsa behsa ç'ekberdanê dike, ya ku, bi dîtina wî, divê di bin çavdêrî-kontrola hêzên ewlek'arîyê yê dewletê da pêk bê. Û evê ew wek merc dide pêş... [8]

Bi r'astî, ev helwest û dîtinên van mirovana, yê ku bi r'ayê mêtîngerîya navnet'ewî hatine ser desthilatê, mirov matma dîkin. Wek ku tê xuyanê, an ewana pîvanên hîskirina demê windakirine û ewqasî kor bûne, ku guhar'tinên demê nabînin û tê nagihîjin, ku naha demne cuda pêr'a gihîştine, ku PKK di nava van 40-45 salan da bûye hêz û hêvîya gelê K'urdistanê û bi wî r'a bûye yek. Ew slogan "PKK gel e, gel jî li vir e!" - her tiştî dibêje, her dimîne, ku mirov wê tê bigihîje, wek ku PKK bi xwe, wisa jî ç'ekên wê misogeriya hebûna gel in, û gel jî dê hema wisa arzan û hêsan dest ji wan bernede, an wan r'adestî desthilata dagerker û mêtîngeran neke, ji ber ku ew dewlet û desthilat ne yê gel in, ew ên dagerkeran in, ên ku ji bo p'arastina desthilata xwe ya mêtîngerîyê bip'arêzin, li hember gel têr'ora dewletê dimeşînin. Eger sibê ev k'omar, a ku navê wê K'T' danîne, bi destûrî wisa bê guhar'tin, ku bibe dewleta hemû gelên wê, û di sêrî da jî, ya gelê k'urd, metirsî û xeteriyên têr'ora dewletê ji holê r'abin, wê demê dê pêdivî ne bi wan ç'ekan bimîne, ne jî hêzên gêrîlla. Wê demê ewê întêgreyî nava art'êşa dewleta xwe û hêzên ewlek'arîyê bibin û wan xurt bikin.

Û ev guhar'tin jî, her dikarin bi Destûra Bingehîn a nû misoger bibin, eger ew wek P'eymana civakî ya gel bê p'ejirandin. Û amedkirina Destûreke wisa jî her bi beşdarîya azad a R'êber Apo dikare pêk bê û azadîyê ji gelê T'irkîyayê r'a bîne!

Dibe, ya ku ew jê ditirsin jî, hema eve?

Di vê pirsê da Erdoxan dîtina xwe ya di derbarê pirsê ewlwk'arîya dewletê da wek xwe bi stratêjî şewazdar dike, wek garantî û misogerîya klîka [9] xwe ya AKP/MHP.

Weha, dema vekirina Konfêransa pirsên ewlek'arîya net'ewî ew dîtina xwe çawa şewazdar dike. Bi dîtina wî, pêvajoya T'irkîya bê têr'or ne ku t'enê siyaseta ewlek'arîyê ye, lê her weha navê dîtina stratêjîk a welatê wan e ji bo sedsala nû. [10] – Helbet, Erdoxan dê ne Erdoxan bûya, eger ewî, hîç nebe, hema hinek r'astî li ber gel vekirana. Naha ew û partîya xwe va, ji bo ku evê sîstêmê hêsanîr bikin xizmeta berjewendîyên klîka xwe, dixwazin guhar'tinan di Destûra Bingehîn a T'irkîyayê da pêk bînin, lê guhar'tinên wisa, yên ku cewherê wê yê t'unekar wek xwe bihêle...

Ev, hemû agahî û dana, yên ku me li jorê anîn, her hinek hûrbînîyên (dêtayî) r'eng û r'ûçikê r'êjîma AKP/MHP bûn (êdî hûn çî navî lêdikin, lêbikin, hûn serbest in!), yên ku me ji vir û wir berevî ser hev kirine, nirxandine, dîtî û şiroveyên xwe anîn zimên, ji bo ku r'ûyê r'astîyê ê vê klîka derê ber ç'avan, ji bo ku bê têgihîştin, k'a ev bazirganên şêr' dê heya k'engê cîhanê bixapînin, k'a ewana wêrekîyê ji k'u digirin, ku r'astîyan ewqasî berovajî bikin, û têr'ora xwe ya dewletê li şûna dadwerîyê bifiroşin cîhanê? Û cîhana xwedêgiravî şaristanî jî, serê xwê kirye ber xwe, van ç'îrokan dibihê û, dema tê, destê xwe li piştê wan dixê û wan berî p'êşîra gelan dide.

Ev hemû pirs in, ên ku pêdivîya xwe bi bersîvên heşmendî hene, lêbelê, ew babeta axavtîneke dinê ne, ya ku pêdivîya xwe bi nirxandin, wat'edarkirin û şiroveyên zanistî heye. Ji bilî wê, gelê k'urd bi bawer e, ku r'ayedar û r'êvebirên T'evgera Azadîyê êdî di vê derbarê da lêger'în û nirxandinên xwe pêkanîne û dê li ser r'êya Pêvajoya 'Aştî û civaka dêmokratîk' li hember wan gavên pêwîst biavêjin.

Pêvajo dimeşe, têk'oşîna gelê kurd gihîştîye serdemek a nû, T'vgera Azadîyê heye, û ev têk'oşîna dê r'êya xwe bibîne. Wek ku di cîhanê da hîç pîrsek nîne, ku bersîva xwe nînbe, wisa jî hîç pîrsgirêkek nîne, ku ç'areserîya xwe nînbe – zû, an derng, hîç ferq nake!

4. Pirs Destûra Bingehîn a K'omara T'irkîyayê û Peymana Civakî

Naha dem pêr'a gihîşt, ku em veger'in ser pirsekê, ya ku bûye ç'avkanîya hemû nak'okî, dijberî, şer' û p'evçûnan û têr'ora dewletê. Ew e ç'avkanîya hemû bedbextî û wêranîyan, ên ku gelên vê herêmê ji ber wan zare-zar in!

Ew Destûra Bingehîn a K'omara T'irkîyayê ye, ya ku îro AKP kirye rojeva xwe.

Wek ku tê r'agîhandin, komîsîona AKP-ê pêşnûmeya Destûra bingehîn a nû amadekirye û dê pêşk'êşî serokk'omarê xwe bike.

Û, eger ev pşnûme, ji hêla Erdoxan va bê erêkirin, wê demê, gor qanûnên cîhana şaristanî, helbet, eger T'irkîya xwe p'arç'eyekî vê cîhanê dihejmêre, divê ev pêşnûme pêşkêşî gel bê kirin, ji bo ku ew wê binirxîne, dîtî û pêşniyarên xwe bîne zimên, piştr'a ew pêşnûme, wek Destûr, di r'êfêrêndûma gel da bê p'ejirandin.

Wek ku tê zanîn, Destûra bingehîn jî peymaneke civakî ye, lewra jî ew divê bi vî awahî bê p'ejirandin (wek ku di t'avahîya cîhanê da, ji bilî wan, ên ku di wan da dîktatorîyên faşîst li ser desthilatê ne!), lêbelê kes nizane, k'a ev mirovana dê çawa t'evbiger'in û çi bir'yaran bigirin, k'a, gelo ev Destûra îro, ya ku Erdoxan wek Destûra derbek'aran nav kirye, dê ji nûva nek'eve bin derbeyeke dinê, vê carê – ya AKP/MHP-ê?! ...

Her çi qas, dîtîyên AKP-ê yê di derbarê guhar'tina Destûra bingehîn da ji yê gel cuda ne, derdê wan ne mafên gelan e, ew li dû wê ne, k'a çawa bikaribin r'êvebirîya xwe hêsantir û misogertir bikin – ji bo sedsalekê jî (?!).

Belê, her çi qas armanc ev e, lê dîsa jî, ev gavek e, ya ku dikare qada goftûgo û nirxandinan veke. Hêzên dêmokrat û pêşver'û (em hêvîdar in, ku ew di T'irkîyayê da hene), nûnerên gelên cuda û, bi t'aybet jî, yê gelê k'urd divê, ji bo mafên xwe yê mirovî, net'ewî, çandî û bawerî bîn bal hev û pêşnûmeyeke Destûra bingehîn a altêrnatîv amade bikin, biweşînin û di nava civakê da dest bi nirxandin û govtûgoyan bikin.

Her bi vî awahî mirovê bikaribê ji gelên bindest û zêrîyayî yê vê mêtîngeha navdewletî ya bi navê K'T' r'a bibe pişt û alîk'ar û k'eda xwe bike nava têk'oşîna pîroz a ji bo mafên gel û net'ewan. An na, t'enê bi bir'yarên nîvhero û nivîşkan ên sazîyên dewleta heyî, yê ku her kêlîyekê dikarin bîn guhar'tin (ji ber ku Destûra bingehîn wê dixwaze!), û her tiştî di avê da r'oda berdin. Garantîya hemû maf û azadîyan jî dikare Destûra bingehîn be, eger

di wê da maf û azadîyên gelan bên misogerkirin. Lêbelê, bi vê destûrê ew her dikarin têr'ora dewletê û t'evkujîya gelan pêk bînin, siyaseta bişaftinê û înk'arê bimeşînin, dest bidin ser r'êvebirî û şaredarîyan, heya dikarin kongrêyên partîyan betal bikin, dikarin endam û r'êvebirên wan bigirin û bê sûc û guneh di hebs û zîندان da r'ehîne bigirin...

Tiştên ku îro di T'irkîyayê da pêk tên: tevkujiya gelan, înkara mafên mirov, nep'ejerandina çandên net'ewan (bêt'ehmûlî), siyaseta bişavtinê, têr'ora dewletê û tiştên dinê, hemû jî bingeha xwe ji destûra bingeîn digirn.

Wek ku tê xuyan, dema Erdoxan behsa destûra derbek'aran kiribû û gotibû, ku zehmet e, bi destûra bingeîn a darbek'aran civak bibe yek, êdî armancek a wan a li ber ç'avan hebûye. Lêbelê, pirs di wê da ye, k'a di bin van gotinan da Erdoxan çî têdigihîje. Gor agahîyên di çapemenîyê da hatine belavkirin, derdê vî camêrî û partîya wî ne ewqas destûreke bingeîn a medenî-şaristanî ye, wek ên cîhana şaristanî, ew dixazin her di wê da hinek guhar'tinan pêk bînin, ên ku dê her bi şewazî hinek tiştan di pirsên r'êvebirîyê da biguhêr'in, lê wat'e û heşmendîya destûrê ya li hember gel û civakên vî welatî heman dimînin.

Ji wan agahîyanan, ên ku di çapemenîyê da gihîştine ber destê me, dertê holê, ku ya sereke, herçar xalên destpêkê yên destûrê di pêşnûmeya Destûra bingeîn a nû da wek berê dimînin, qey bibêjî, ew herfên Pirtûka pîroz in, û nikarin bên guhar'tin!

Hê heyşt meh berê me di çarç'oveya gotara xwe ya di derbarê Civîna Giştî ya R'êxistina Net'ewên Yekbûyî da wisa jî di derbarê Destûra Bingeîn a K'T' da nirxandinek pêk anîbû. Wê demê me gotibû, ku: "... hemû pirsgirêk û astengîyên li ser r'êya destanîna mafên mirovî û net'ewî yên gelê k'urd (dîsa wek net'ew!) di dewletekê da dixitimîn, a ku hêzên cîhanê yên hêgêmon destpêka sedsala XX li ser bingeha net'ewek a bi sînî hinartî (a ji ber xwe derxistî!) damezirandine (dîsa bi sînî!) û navek jî ji bo wê dîtine (an p'eyda kirine!) – K'omara T'irkîyayê, û ew kirine bela serê hemû gelên herêmê, bi t'aybet jî, a gelê k'urd...

Û ji bo ku ev dewleta bi bingeha xwe ya ne xwezayî û sînî va, wek sazîyek a bîyanî (xerîb) a dijî hemû norm û pîvanên mirovî, exlaqî, dadwerî, heya dijî pîvanên xwezayê, li ser xaka vê herêmê cîh bikirana, divê ji bo wê bingeîn qanûnî amade bikirina. Û, ji bo ku hemû k'arên dijmirovî yên vê dewletê r'ewa û qanûnî bihatana dîtin, divê ji bo wê destûrek jî bihata nivîsîn. Ji bo vê jî hewl hatine dayîn, û di encamê da destûrek derk'etî holê, ya ku îro

wek Destûra Bingehîn a K'omara T'irkîyayê tê zanîn (Türkiye Cumhuriyeti Anayasası).

Ji bo çi em wisa bi hûrbînî ji dûrva destpê dikin?

Lewra ku ew sûcên ku vê dewletê li dijî mirovahîyê pêk anîne û îro jî pêk tîne (têr'ora dewletê, înk'ar û t'evkujîya gelan û qedexeya ziman û çanda wan, wêranî û t'alana gund û bajarên demekê şên û ava...), ne hema wisa encama k'arên hinek dîktatorên bi derûnî nexweş û sewdaser bûye, ew sûcana bi destûrî hatine r'ewakirin, û bingeha vê dewletê jî li ser wan hatye danîn - wek sazî-mek'anîzmek a têr'ora dewletê ya navnet'ewî!

5. Nirxandina Xalên 1, 2, 42 û 66 ên Destûra Bingehîn di Çarç'oveya R'êziknameya NY da

Ji bo ku t'evahîya dijmirovî û sûck'arîya vê dewletê derê ber ç'avan, em t'enê çend xalên "Destûr"-a wê yên di wê derbarê da bînin, a ku yek bi yek mak dike, k'a dewlet dikare (û divê!) çawa mafên mirovan bînp'ê bike, gel û net'ewan t'une bike, û di heman demê da hemû sûcên wê r'ewa û qanûnî bînin dîtîn, û kesek tê jî nagihîje, k'a ew wan hemûyan ji navê k'ê û ji bo xatirê xweşbextîya çî net'ewê an mirovan pêk tîne!

Weha, bala xwe bidinê, di beşê destpêka vê "belgeyê" da çî tê r'agîhandin:

*Ev Destûra li gor têngîna bingehîn a net'ewperestîya damezirînêrê
K'omara T'irkîyayê ... At'atûrk, her weha bi r'ê û r'êgezên şoreşgerî,
yên ku ewî r'agîhandine, hebûna heta-hetayê ya net'ewa t'irk û welatê
wê û yekgirtîbûna Dewleta t'irk misoger dike...*

Di beşê I da (R'êgezên giştî / Şêwazê dewletê I./ Xala 1.) tê gotin, ku:

Dewleta T'irkîyayê - k'omar e.

Û piştî vê, di xala 2. a beşê II. da ji bo t'aybetmendîyên k'omarê tê gotin, ku:

*K'omara T'irkîyayê - dewletek a dêmokratîk, laik û sotsîal e, ya ku li ser
bingeha pîvanên dadwerîyê, ... r'êzgirtina bi mafên mrov r'a, ku
girêdana xwe bi net'ewperestîya At'atûrk r'a heye û li ser bingeha wan
r'êgezên sereke hatye avakirin, ên ku di beşê destpêkê da hatine
r'êzkirin...*

Di xala 42. da di derbarê maf û erk'ên p'erwerde û fêrbûnê da tê gotin, ku:

*... Ji bo hemwelatîyên T'irkîyayê ji bilî t'irkî hîç zimanekî dinê nikare di
sazîyên p'erwerdeyî da ji bo p'erwerdeya zimanê dê bê k'aranîn...*

Û xala 66. a vê “Destûrê” jî di derbarê hemwelatîbûna T’irkîyayê da r’adigihîne, ku:

Her kesek, ê ku bi erk’ên hemwelatîyê bi dewleta T’irkîyayê va girêdayî ye – t’irk e! [11]

– Hema wisa, ne kêr, ne zêde!

Naha me dixwest, ku her mirovek, ê ku hema hinekî têgihîştina xwe bi pirsên şaristanîya mirovahîyê, mirovbûnê, mafên mirov, dadwerîyê, wekhevîyê, têk’ilîyên navdewletî û têgînên dinê heye, fermo, bila van r’êgez û armancên vê dewleta bi sînî hinartî hilde û di nava goveka (çarç’ove) wan r’êgezên R’êziknameya NY da binirxînin...

Eger kesek bikaribe, di nava xwe da hêz û zanebûnê bibîne, bila derê pêş û bibêje, k’a dêmokrasî, laikî, sotsîalî, ... r’êzgirtina bi mafên mirov r’a bi çi awahî dikarin têk’ilîya xwe bi net’ewp’erestîyê r’a hebin – ew net’ewp’erestî ya k’ê dibe, bila bibe?!

Îjar dibêjin – faşîzm ji k’u tê?!

Û li vira bi heşmendî pirs dertê holê, k’a r’êxistineke weha ya navnet’ewî (çi nav lê lêkiribin, bila lêkiribin – ‘Net’ewên Yekbûyî’, yan ‘Dewletên Yekbûyî’, hîç ferq nake!), a ku hema di destpêka R’êziknameya xwe da r’agîhandye, ku ew “... bi bir’yar e”, bi her awahî mirovahîyê, mirovbûnê, şaristanîyê, dadwerîyê, wekhevîyê, aştî û aramîyê bip’arêze, ... çawa dikare dewletek a li ser bingeh û r’êgezên net’ewperestîya mirovekî hatibe damezirandin (ew mirov At’at’ûrk dibe, Mûsolînî dibe, Hîtlêr dibe, Gêbêls dibe, Pînoçet dibe, an yekî dinê dibe, hîç ferq nake!), hilgire nava r’efên xwe?!

Ma, r’êjîmên weha, yên ku daxwez û r’êgezên dijmîrovî yên destûrek a bingehîn pêk tînin, dê bikaribin (an bixwazin!) wan mercên R’êziknameya NY pêk bînin?

Helbet, ev pîrsa hir’êtorîk e, û hîç pêwîst jî nake, ku mirov li bersîva wê biger’e, bersîv di vê pîrsê bi xwe da heye!” [12] – Ev – ji bo têgihîştina pîrsê bi giştî!

6. Encam: Pêwîstîya Destûreke Nû ya Dêموكراتîk û Pêşnûmeya Alternatîv

Ma mirov di vê r’ewşê da çi dikare û divê pêk bîne?!

Evê pêvajoyê bi xwe r’a gelek r’astî û derfet derxistin holê, wisa jî makkirin û r’êgezên bîrdozî yên mîmarê vê pêvajoyê bir’êz Ocalan li holê ne, yên ku

hemû t'erefên tarî yê nê dewletê r'onî dîkin, û r'êyên ç'areserîyê destnîşan dîkin. Û, eger r'êjîma K'T' bi r'astî dixwaze, ku k'omar di sed sala xwe ya duyem da hebe û mayînde be, divê pîrsa Destûra Bîngehîn wisa hêsan, bi destekî sivîk, bi şêwazî neguhêr'e. Ji bo K'omara T'irkîyayê Destûrek a nû pêwîst e, û ew jî divê li ser van pîrên sibên bîngehîn ên p'eyama Rêber Apo bê avakirin: "...R'êzgirtina nasnameyan, azadîya r'amanê, r'êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhatayan t'enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe. ... Ji dêmokrasîyê pêva t'u r'êyeke dinê ya lêgerîna p'ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk'ên e..."

A, eger ji nava hêzên dêmokratîxwaz k'omek derê û bixwaze Pêşnûmeyek a alternatîv a Destûrek a nû amade bikin, ew dikarin ji bo wê wan gotinên R'êberê gelê k'urd birêz Ocalan bîngeh bigirin û li ser wê pêşnûmeyek a Destûra nû amade bikin, û dema weşana wê jî, eger bixwazin, dikarin van gotinên Erdoxan jî wek serpeyam daynin - na, na, ne ji bo Destûrê, lê ji bo weşana pêşnûmeya wê: "...T'irkiye êdî bi destûra bîngehîn a darbêk'aran nikare berbi sîber'ojê ve bimeşe. Êdî pêwîstî bi destûreke sîvîlan heye, ne ya derbêk'aran".

...Helbet di vî warî da dîtinên me hene, eger pêwîstî pê hebe, emê wan pêşk'êş bikin!

Dema gotarê dî ji bo weşanê amade bû, di çapemenîyê da p'eyama endamê Fermandariya Navenda P'arastina gel (NPG) r'êzdar Mûrad Karayilan hate weşandin, a ku wî bi wesîleya Meha Şehîdan a Fedaî bi dîmen ji Hêzên P'arastinê r'a şandibûye. Di P'eyamê da pêvajoya û r'ewşa siyasî tîn nîrxandin, û tî destnîşankirin, ku, ji bo pîrsgirêka k'urdî bê ç'areserkirin, divê di Destûra Bîngehîn da statûsa gelê k'urd r'ewa û misoger bibe, û, ji bo ku pîrsgirêkên heyî bî ç'areserkirin, berya her tiştî divê R'êber Apo azad bibe...

P'eyam bi t'evahîya xwe va li vira ye:
<https://kurmanci.anf-news.com/kurdistan/karayilan-dive-reber-apo-azad-bibe-213665>

7. Gotarên Nivîskarên bi vî Mijarê

"R'êjîma baasî ya Sûrîyayê k'et - ev dawî bû, an - destpêkek a nû?!" -
https://www.academia.edu/127295300/R_ÊJÎMA_BAASÎ_YA_SÛRÎYÊ_K_ET_P_IRSGIRÊK_DAWÎ_BÛN_AN_HER_TIŞT_JINÛVA_DESTPÊ_DIBE

“R’ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r’êjîma baasî, pirsgirêka k’urdî r’êyên ç’areserîya wê!” -

https://www.academia.edu/127588979/REWŞA_SÛRÎYAYÊ_PİŞTÎ_TÊKÇÛNA_RÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_KURDÎ_Û_RÊYÊN_ÇARESERÎYA_WÊ

“R’ojeva k’urdî ya cîhanê, pêvajoya aşîyê û pêşk’evtinên Sûrîyayê!” -
https://www.academia.edu/128143358/ROJEVA_KURDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞKEVTINÊN_SÛRÎYAYÊ

“Newroza azadîyê, pêvajoya aşîyê, astengî û xeterîyên li ser r’êya wê û çend têbînî” -

https://www.academia.edu/128329196/NEWROZA_AZADÎYÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_ASTENGÎ_Û_XETERÊ_LI_SER_EÊYA_WÊ_Û_ÇEND_TÊBÎNÎ_AEdocx

“Pêvajo û r’ojeva k’urdî - k’î wan çawa dibîne û têdigihîje!” -
https://www.academia.edu/129520311/PÊVAJO_Û_ROJEVA_KURDÎ_KÎ_WAN_ÇAWA_DIBÎNE_Û_TÊDIGIHÎJE

“Pêvajoya aşîyê û civaka dêموكراتîk, helwesta r’êjîma AKP/MHP û r’astîyên dîrokî!” -

https://www.academia.edu/143100204/Kîdij_kîteref_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_CIVAKA_DÊMIKRATÎK_HELWESTA_RÊJÎMA_AKP_MHP_Û_RASTÎYÊN_DÎROKÎ

“Her çiqas r’êjîma AKP/MHP hewl dide, ku pêvajoya aşîyê û civaka dêموكراتîk têkbibe, lê yek e, ew dimeşe û r’astîyên dîrokî derdixe holê”.- AE

https://www.academia.edu/143909380/HER_ÇIQAS_RÊJÎMA_AKP_MHP_HEWL_DIDE_KU_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_CIVAKA_DÊMIKRATÎK_TÊKBIBE_LÊ_YEK_E_EW_DIMEŞE_Û_BI_XWE_RA_RASTÎYÊN_DÎROKÎ_DERDIXE_HOLÊ

“Vê carê Civata Giştî ya R’êxistina Net’ewên Yekbûyî mirovahî matma hişt”.- AE

https://www.academia.edu/144499218/VÊ_CARÊ_CIVÎNA_GIŞTÎ_YA_R_ÊXISTINA_NET_EWÊN_YEKBÛYÎ_MIROVAHÎ_MATMA_HIŞT

“... Û gavek jî li ser r’êya berbi aşîyê û civaka dêموكراتîk va” - AE -
https://www.academia.edu/145496968/Û_GAVEK_JÎ_LI_SER_RÊYA_BERBI_AŞTÎYÊ_Û_CIVAKA_DÊMIKRATÎK_VA

“Dîrok xwe dubare dike” - AE -
https://www.academia.edu/150259329/DÎROK_XWE_DUBARE_DIKE

“Hişyar bin! Mirovahî di nava tora dek û dolabên navdewletî da têk diçe”. – AE.

https://www.academia.edu/164663373/Hişyar_bin_Mirovahî_di_nava_t_or_a_d_ek_û_dolabên_navdewletî_da_têk_diçe

“Ev şer’a ê k’ê ye?”. – AE.

https://www.academia.edu/165246241/EV_ŞERA_Ê_KÊ_YE

14.06.2026 — Payatîgorsk / R’ûsîya

8. Jêrenot û Ç’avkanî

[1]

https://www.academia.edu/128143358/ROJEVA_KURDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞKEVTINÊN_SÛRÎYAYÊ

[2]

https://www.academia.edu/143100204/Kîdij_kîteref_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_CIVAKA_DÊMIKRATÎK_HELWESTA_RÊJÎMA_AKP_MHP_Û_RASTÎYÊN_DÎROKÎ

[3]

https://www.academia.edu/143909380/HER_ÇIQAS_RÊJÎMA_AKP_MHP_HEWL_DIDE_KU_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_CIVAKA_DÊMOKRATÎK_TÊKBIBE_LÊ_YEK_E_EW_DIMEŞE_Û_BI_XWE_RA_RASTÎYÊN_DÎROKÎ_DERDIXE_HOLÊ

[4] Di vê derbarê da wisa jî di gotara: “Erdogan: Bi vê destûra bingehîn Tirkiye nikare ber bi siberojê ve bimeşe” da – <https://kurmanci.anf-news.com/rojane/erdogan-bi-ve-destura-bingehin-tirkiye-nikare-ber-bi-siberoje-ve-bimese-197797>

[5] <https://kurmanci.anf-news.com/kurdistan/reveberiya-tevgere-desthilatdariya-akp-mhp-e-gaven-pewist-en-ji-bo-careseriye-dive-beyi-derengxisti-213077>

[6] <https://kurmanci.anf-news.com/rojane/kalkan-tekiliya-bi-Imraliye-re-bi-rek-u-pek-nebe-pevajo-bi-cekeri-nikare-bimese-213109>

[7] <https://nupel-kurdi.com/numan-kurtulmus-li-ser-pevajoya-nu-axivi-siyaset-de-berpirsariya-xwe-bi-cih-bine/>

[8] <https://nupel-kurdi.com/numan-kurtulmus-dive-ev-pevajo-be-temamkirin/>

[9] Klik (frans. clique – k’oma cerdevanan, cerd, çete) – Di warê siyasî da ev p’eyva di Cîhanê da ji bo wan k’omên mirovan tê k’aranîn, ên ku li ser bingeha berjewendîyên sazî (korporatîv), siyasî, darayî û sotsîalî bûne yek û daxwezên xwe yên berjewendîp’erest bi r’êya sazî û dezgehên dewletê pêktînin. Klîk ji wan ferdan pêk tê, yên ku ji heman derdor û beşên civakê ne û bi berjewendîyên hevpar hev girtî ne. Di cîhana siyasî da dîktatûrîyên wek a Hîtlêr di Almanîyayê da, a Franko di Îspanîyayê da, a Salazar di Porûgalîyayê da, a Pînoçet di Çîlîyê da û yên wek wan, klîk tên navkirin. R’êgezên sereke, yên ku van dîktatorîyan digihîn hev, ev in: t’unebûna pêşbirkê (r’eqabet, competition), hîrarşîyeke hişk û kontrola ser hemû warên jîyanê, piştgirî û desteka ji hêla sazî û dezgehên sereke va. – Di vê derbarê da di wikipedia-yê da t’êra xwe agahî hene.

[10] <https://nupel.tv/erdogan-terorsuz-turkiye-sureci-ulkemizin-stratejik-devlet-vizyonudur/>

[11] <https://legalns.com/download/books/cons/turkey.pdf> ;
https://www.academia.edu/32260723/Türkiye_Cumhuriyeti_Anayasası_pdf

[12]

https://www.academia.edu/144499218/VÊ_CARÊ_CIVÎNA_GIŞTÎ_YA_R_ÊXISTINA_NET_EWÊ_N_YEKBÛYÎ_MIROVAHÎ_MATMA_HIŞT